# ZIRYABÊ KURDÎ

**Destpêk:**

Dema behsa şaristanî û jiwariya kevin tê kirin, her kes destpêk berê xwe dide Zagros, Toros, Mezopotamyayê, di rastî de jî her weha ye û Kurdistan mezin hêlîna destpêka şaristanî û jiyana mirovî bûye, bêguman fikir, hûner û zanist yd.. bingeh û stûnên wê şaristanî û jiyariyê bûne. Mûzîk û hûner ku mebesta me ya vê mijarê ye, xwedî reh û rîşeyeke kûr û dûr e. Zêdetir 5300 sal berî niha Sumerî îcatkarê mûzîkê bûne.

Fikir, felsefe û rêbaza Mêhr û Mîtrayî ku dîroka wê zêdetirî 5000 salan e, mûzîk paye û erengeke mezin digire xwe. Amûrên Tnebûr, Def û Şimşal yd.. rastiya vê bawerî û jiyarê didin şan dan. Kurd berî çendîn hezar salan rêhevalê hûner û mûzîkê bûye û paşxana wê di dînê Mîtrayiya kevin û her sê dînên paşîn ku şaxên Mîtrayî ne "Yarsanî, Zerdeştî û Êzîdî"yê, vê argumentê didin destê me, her herêm, her dever û tenanet her gundekî jî bêpar nîne ji hûner, mûzîk, lawje, dengbêjî û lorînê. Kurd di warê hûner û mûzîkê sertop û pêşnega gelên cîhanê ye û Ziryab yek ji nimûneyên herî berçav e ku ji kangeh û hûndira Kurdistanê û mezopotamiyayê derdikeve qada hûner, mûzîk, îcatên her alî yên jiyanî û civakî. Dîrokên îro di cîhanê û bi taybetî Ewropeyî û rûsî de heye, bi armancên siyasî û serdestî hatine nivîsandin. Her weha wê dîrokê ku ji Kurd re hatiye nivîsandin, seranserê wê çewt û dûr in ji rastiya dîroka Kurd weke ku heye. Divê êdî Kurd bi awayekî zanistî û durust dîroka xwe binivîse û temamê vê dîroka derewîn û nerast hilweşîne û wê rastiya bide şandan ku pêşengiya beşek mezin di şaristanî û rewşengeriyên cîhanî ji ax, çand û ruhê Kurdî ve derketine û belavên dunyayê bûne. Cîhan bê Kurd dîrokeke ne zelal û ne aşkere ye, dîrokeke şêlû û aloz e. Ziryab yek ji wan dîroka veşartî û dizîmayî ye ku xencî hin dîroknas û kesatiyên diyar, ti kes rastiya wê weke ku heye nenivîsandiye. Ez di vê kurte behsa Ziryab de dixwazim bala Kurd û pênûsmendên Kurd bikêşim ser vê dîroka mêntalît-siyasî-serdetiyê ku temamî bi meramên monopolî hatine nivîsandin.

**Jînîgarî**:

"Ziryab efsaneya Mûzîka Rojhilat û Rojava, Ciwanekî Kurd ê sorgunî"

**Hûnernas**, **Mûzîknas**, **Çandnas**, **Etiketnas**, **Estetîknas**, **Hûnermend**, **Ûdûlûd**, **Awazsaz**, **Şaîr**, **Mamosta**, **Modîlîst**, **Dîzayner**, **Gerdûnnas**, **Erdnîgarnas**, **Seqanas**, **Botanîk**, **Chêf**, **Îcatkar** û **Zana**"yê Kurd Ziryabê Kurdî" navê wî El-hesen" Alî Nef'î"ye, navê wî "Zêraw"e anku ava zêrê, avzêr, zêrav ku weha rave dikin nav bi esil "Zeryaw yan Ziryaw" bûbe ji ber ku wê demê zimanê Pehelwanî bo nivîsandinê hatiye bikaranîn, peyva "Û"yê û AW"ê weku "AB"ê hatibe nivîsandin bûbe "Ziryab"ê. Lê hinên din navê wî vedigerînin ser "Suhrab yan Zorab"ê. Ziryab di sala 789ê zayinî de li başûrê Kurdistanê, li bajeroka Şêxanê ya girêdayî bajarê Nînova(Musil)ê yaw ê demê ji dayik bûye û di dawiya çaxa 7ê û destpêka çaxa 8ê de li bajarê Begdadê di dema dewleta Abbasî ya Îslamî de ku paytexta wê Begdad bûye jiyaye. Ziryab deh zarokên wî hebûn 8 kur û 2 keç bi navên "Abdulrehman, Abdulleh, Yehya, Cafer, Muhemed, Qasim, Ahmed, Hesen, Aliye û Hemdûne"yê, tiştê ku tê gotin, Ziryab bi hevjîna xwe re gelek dilovan û qenc bûye.
Jîndema Ziryabî hevdema xelîfeyê Abbasî "Herûne Reşîd"î bûye. Ziryabê Kurdî di sala 857-858ê zayinî li bajarê "Kurdoba(Qurtube)"ê di temenê 67-68 saliyê de koça dawiyê kiriye.

## Jiyana Ziryabê Kurdî:

Ziryabê Kurdî di dema dewleta Îslamîyê de li Kurdistan, Mezopotamya, bakurê Afrîka û Spanyolê di demên cuda de jiyaye, weku kesatiya mezin nasnavê polîmatî lêkiribûn. Ziryab şagirtê Îshaq Musilî bû ku mûzîkjenê navdarê Begdadê û dilxwazê xelîfeyê Abbasî "Harûne Reşîd" bû, Îshaq Musilî di navbera salên 767-850ê de jiyaye ku ew jî Kurdekî Musilê bû û şagirtê Îbrahîm Musilî bû ku ew jî Kurdê Musilê bû. Behre û jîr bûna Ziryab hêdî hêdî asta mamostayê xwe derbas kiribû, Rojekê Harûne Reşîd ji Îshaqî dixwaze ku dengekî nû pêşkêşî koşkê bike, Îshaq jî Ziryab bi xwe re dibe koşkê, dema Ziryab Ûd dijene û distrê, Herûne Reşîd pir sermesta deng û hûnera Ziryabî dibe û ji Îshaq re dibêje ku giringiyeke baştir bide Ziryab, ev bû destpêkeke nû ku Ziryab ji xelîfe û pêwendên wî nêz bibe. Ev rewş dibe sedema dexesiya Îshaq Musilî, ta digihe asta ku gelek arîşe û astengiyan ji Ziryabî re çê dike eşkere ji Ziryabê re dibêje: jîr û jêhatbûna te her ku tê bilind dibe û bi ser min de ser dikevî, ev dibe sedema lawaz bûna pêgeha min û divê tu Begdadê bihêlî. Ev rewş dewam dike heta ku gefa kuştinê li Ziryab dike eger Begdadê nehêle, Ziryab jî êdî bi yekcarî di şeveke tarî de bi hevjîna xwe re bajarê Begdadê dihêle diçin. Li bakurê Afrîkayê bo demekê li cem "Benî Exlab"ê li "Qerewan"ê dimîne û dûre

biryar dide biçe Endelûsê. Weku tê gotin: Elhakim xelîfeyê Ûmewî û bavê Abdulrehmanê duyemîn, Ziryab bang dike Endelûs, Vendalûs(Spanyol)"ê. Lê hin dibêjin Ziryab ji aliyê şandeke bi serkatiya stranbêjekî cihû bi navê "Mensûr" pêşwazî lê hatiye krin. Ziryab bi Lîvant, Misir, Tunsê re digihêje tengava spî û çiyayê Tarîqê, di sala 822ê de diçe paj-girava Îbîryayê û Spanyolê û bajarê Kurdobayê, ew her li bajarê Kurdobayê warnişîn dibe. Ziryab li derbar û dîwana xelîfeyê hûnermend bûye û çûyina wî hevdem bû ligel rewteke nû ya çandî û hûnerî ku ji aliyê Abdulrehmanê duyem ve dihat destek kirin. A.Rehmanê Duyem ji 822-852ê dajdar bû. Resansên wî bû sedema rewt û asteke baş a çandî û hûnerî li Endelûsê ku Ziryab roleke mezin têde dît. Ziryab di sala 822ê de li bajarê Kurdobayê bû mêvandarê dadistan(mehkeme)yê ya Kurdobayê li Endelûs(Spanyol)ê bi mûçeya 200 dînarên zêrîn. Her weha dûre bo demekê bû wezîrê çandî jî. Her weha debistaneke mûzîkî ya bi navê Ziryab jî ava kir ku ji şagirt ji Fransa, Almanya û bakurê Spanylê ve dihatin vê debistanê. Xweşrewşî û pêşwaziyên xelkî li xebatên wî, bû derfeteke şahane û zor giring ji bo Ziryab ku geşe bi îcat û xebatên xwe yên pir alî bide û gelek navdar û qedirdar be jî. Vê post û paye bû destek û derfeteke mezin ku behre û xebatên xwe gelek pêşbixe di her warî de.

**Behre û xebatên wî**:

Ziyab agahî di Hûnernas, Mûzîknas, Çandnas, Etiketnas, Estetîknas, Hûnermend, Ûdûlûd, Awazsaz, Şaîr, Mamosta, Modîlîst, Dîzayner, Gerdûnnas, Erdnîgarnas, Seqanas, Botanîk, Chêf, Îcatkarî û Zanyarî"yê de hebûye. Çîrok vebêjeke navdar û şaîîr bûye. Her weha xwedî dengekî efsûnawî bûye, bi sedema wî dengî nûwaze û rengê têrîn, nasnavê "Ziryab"ê lêdanîn anku "Zêrav". Ziryab ne tenê şoreşeke mezin di mûzîkê de kir, belku şoreşeke mezin di terza jiyana moda û entelktualiyê de jî kir. Ziryab ew kurê Kurd bû ku hemû ewropeyê di asteke bilintir û bajarmendîtir fêrî etiket û akarên jiyanê kir. Ew şoreşeke mezin di mûzîka çerxa navîn û terza jiyanê de kir û moda, stayila por û pîrayişê, mobîliyat, etiketên xwarina ser maseyê, terza xwarinê, peywendiyên civakî û aramiyên mirovan guhert.

**Hin ji îcatên Ziryab**:

- Ziryab yekemîn akademiya hûnerî û konsêrvatorê li cîhanê îcat û ava kir ku fêrkirin û fêrgeha "Harmonî û awazsazî"yê bû ku biryar bû di çerxên paşîn de jî zêdetir geşe bike.

- Îcatkarê mûzîka Flamînko’yê ye û gelek ji dîroknasan mûzîka Flamînkoyê vedigerîn ser îcatên Ziryabî.
- Ziryab yekemîn kese ku zagona fêrkirina stran gotinê ji merheleyên seretayî ber bi giranîyê li ser çend binemayan ew jî:
  1.Kesî seretayî fêrî terazûya şîîrê dibe û şîrr li ser lêdana teplê dixwîne.
  2.Wê awazê didin kesên seretayî û bê azmûn û bê xemlandin.
  3.Sereta fêrî xemlandina stranê dibe di van awazan de ligel kromatîkê piştî fêrbûna terazûya tespîta awazê.
- Ziryab zagonên “Solfec(Solfege)”ê û perwerdeyiya deng û bihîstinê darîştiye.
  *Têbînî: Solfege peyveke Fransî û bi esil Întalî ye, ji du peyvan pêk tê, “So” anku “nîşana ruh” û “Fecî, Feco”yê jî tê wateya “kiryar”ê û peyvên “s”ê û “veg”ê tê wateya “Kiryara Sol”ê. Solfege anku: gotina notên mûzîkê li gor serdemên wê ligel “Nalî”yê bê ku nav û peyvên wê bên gotin.*
- Mûzîkên Ziryab li ser binemayên rojhilatî bû ku zagonên teorî û hêmayên mîtafîzîkî têkel dikir.
- Stêrnasî û fîzolojî û teoriyên wî li ser bingehên Hîndî, Îranî û Yunanî.
- Çareserên derûnî û aramiyên ruh bi rêya mûzîkê ji îcatên Ziryabî bû.
- Têkel kirina meqamên mûzîkî yên cuda û zivirokî ku piştî wê sîstema dengî û okestrayî û dîtina strana mûzîkî di okestrayê de serî hilda ku hemû di peyva “Noba”yê de şênber bûn. Ev jî rêkxistina okestrayî ya parçe mûzîkî ye yan lîrîkî ye.
- Ziryab binnema û zagon û prensîpên paj paj kirina mûzîk, zanista harmonî û polîfona mîlodî îcat kir û dasaz kir.
- Ew yekemîn îcatkarê vê nanxwarinê ye ku îro mod û etiket e di cîhanê de ku, destpêk “sûp xwarin”, dûre “awêze(salate) xwarin”, dûre “xwarinên sereke”, dûre “şîrînî” û dûre mêwe.
- Ziryab bingeha test û nirxandina fêrxwazên xwe dikir li fêrgeha mûzîkî de, ew system ta niha jî di navend û fêrgehên mûzîkî de tên peyrew kirin
- Ew yekemîn îcatkarê terza poşîn(cil li ber xwe kirin)a kincên havînî û zivistanî ye ku ji bo her werz û demsalek kincekî taybet dipoşî(cil li ber xwe dikir).
- Îcat kirina amûra “Piyano”yê bi terzeke cudatir ji niha ku wê demê jêre digotin: “Şefîr”.

- Ziryab noteke nû ya “DO RÊ MA FA SOL”ê berhem anî ku ew bû bingeha mûzîka klasîk a Spanyolê.
- Ziryab destkef û gaveke mezin avêt di wê çaxê de ku hûnera stran û mûzîkê di asta bilind a çîna jinan û di malên zengîn û wezîran de da nasîn di demekê de ku tejî bibû ji korker, xizmetkar û kolekeçan. Ziryab vê engavê ji her du keçên xwe re “Aliye û Hemdûne”yê destpê kir ku zugurt(selt) bûn.
- Vê şîrîniyê ku îro weku “Zelebî. Celebî”yê tê nasîn ji îcata Ziryabê ye.
- Şahî û şadiyên di rojên cejn û dawetê de bi terzên nû ji îcatên Ziryabê ne.
- Defr û qedehên şûşeyî li dewsa defrên zêr û zîvî ji îcatên Ziryabê ne.
- Xemlandina ser maseyan ji ketan û kulîlkên madenî yên curancur ku berê ti çandeke ser maseyan nebû li Spanyolê.
- Ziryab ji xwarinên têr kelandî hez dikir, berî Ziryab xwarinên Spanyolî sade bûn. Lew Ziryab sîstemeke dasaz li koşkê ji bo jemên sereke danî, Şahzade jî wê qebûl kir. Destpêk şorba, dûre masî û mirîşk pêk dihat, yan jî goşt dûre mêwe, şîrînî û gûz. Di wê demê de bi sedema zêdebûna goşt, masî, firinde, sevze û mêweyên herêmî, welêt geşeyeke mezin kir bi taybetî jî “Badem, penîr, şîrînîyên weku dombel û şorbê. Her weha Ziryab çend curên sevzeyan jî bi Endelûsê da nasîn weku “Travêl û Endîv”ê ku cihê şorbayê vegirt. Van xwarinan dûre li hemû Ewropeyê belav bûn û bêjeya înglîz a “from soup to nuts”ê vedigere ser terz û şorbayê ku Ziryabî îcat kirî.
- Kevîk û kêr, cihê dest û tilî vegirt, ew jî ji îcatên Ziryab in
- Her weha Ziryab rî tiraşîna mêrî kir moda. Her weha terzên li pişta guhê ve tiraşîn yd..
- Ziryab xelkê Spanyolê fêrî zagonên pakijî û xwe şûştinê dikir.
- Li dewsa ava kulîlkê, Ziryab îcata xwê bikaranî ku wê demê kesên zengîn û mezinan li kincên xwe didan.
- Îcat kirina parfoma “Murdansîng”ê ji bo nehêlana bêhna xum û xwêdanê
- Fêrgeheke estatîka jinan damezirand li nêzî Gazarê ku koşka şah bû, van şoreşa civakî yên Ziryab bandor danî ser gelek aliyan, ji wan jî “por qusandin, terza xemlandinê, nasandina parfomên ji curên nû, hemamên giştî
- Dîzayin û çêkirina hemamên giştî ya bi “Kûre”yê ku ev şêwazeke kevnar a Mezopotamya û Kurdî bû ku di nav Zerdeştiyan jî hebûye. Ziryab bi terzeke hin cudatir wê îcat kir û dûre belav bû hemû Ewropeyê û Osmanî jî dûre vê hemamê bikardianîn û niha weku “Hemamê Osmanî yan jî hin caran weku

hemamê Tirkî” tê binav kirin ku ti peywendiyekê bi Osmanî û Tirkî ve nîne. Ev Dîzayin û terza Ziryabê bûye û dûre belav bûye, wê demê ji vê cure hemamê ku çêdibûn navê Ziryabê danîn ser weku terza hemamên Ziryabî. Gerek niha navê wê “Hemamê Ziryabî” bûya, ne navên saxte û çêkirî.

- Îcata terza pîrayiş û arayiş anku terza por qusandinê kir.
- Weter û tela pêncemîn ji bo amûra mûzîkî ya “Ûd”ê zêdekir ku li ser şêweya gûz hîndiyê ye, her weha jêyên Ûdê ku 12 yan 14ê bûn, bûn 5 jê, di 6 yan 7 track de grop dibin, mewdaya dengê wê nêzî du oktav û nîv digire.
- Îcat kirina nivîsandina şîîrê li ser kincên stranbêjan û amûrên mûzîkê de
- Îcatkarê hevîrê diranê ye, Ziryab yekemîn kes bû ku hevîrê diran şûştinê îcat kir û dûre belavê hemû ewrope û cîhanê bû ta îro jî ku bûye pêwîstiyeke rojane ya her kesî li seranserê cîhanê.
- Ew yekemîn kes û îcatkarê “fashion”ê ye, anku fashion û dîzayina poşakê û cil û bergê îcat kir û guhertin û modeke mezin di poşak û kincên Kurdî de kir û geşe da wê terz û modayan.
- Ew yekemîn îcatkarê fashion û dîzayina modayên sol û pêlavê ye.
- Ew îcatkarê poşak û kincên kûmdaran e
- Ew poşak û kincê kûmdar ji dadwer û dadmendên Endelûsê îcat kir û dîzayin wî kir, dûre ji bo warên zanistî û akademî yd.. Ta niha jî wî poşak û kincî weku xwe maye li ber dadwer û dadmend, herweha li ber kesên akademî, astên bakaloryos, master, doktora, professor yd.. , xwînyarên zanîngehê yd..
- Ew poşak û kincê kesatiyên Marakîşî îcat kir û dîzayin kir, herweha raper û kesên hûnerî jî
- Ew yekemîn kes bû ku di warê mûzîkê de “Lût(Elwe’d”ê bi Spanyol û Ewrope bi giştî da nasîn. Her weha Ziryab xwedî çendîn îcatên mezin e di warê mûzîk û dîzayinê de, em dikarin bibêjin ku Ziryabê Kurdî yekemîn îcatkarê mûzîka çerxa navînê ye di cîhanê de.
- Ligel Elkîndî, zanayê gerdûnnasî û stêrnasiyê, karîn îcata zêdekirina wetera pêncemîn a amûra mûzîkî ya Ûdê.
- Her weha plêktromiya ji perrên teyra bazê çêkirin ku berê ji darî bûn.
- Ew awaza strînê li bajarê Medîneyê bo awaza Kurdî û Mezopotamyayê guhert.
- Poşak û kincên werzişiyê bi terzên nû îcat kir ku guncav bû bo demên di du demsalên cuda de.

- Ziryab “Masaj” anku şêlana beden be ava gul û zeyta zeytûnê fêrî xelkên Endelûsê kir û belav kir.
- Meqama “Tewaşîha Endelûsî”yê îcat kir û her weha gelek awaz û meqamên nû xiste nava hûner û mûzîkên wê serdemê.
- Ziryab îcata “Sirûd”ê bi awayeke nû kir û binemayên fêrbûna strînê danî.
- Teoriya mûzîkê bi temamî analîze û organize kir, paramêtên metrî û rîtmîyê serbest kir û terza nû ya derbêj kirina “Swîtî ya Weşa, Zecal û Newba”yê îcat kir. Gelek kesên mîna “Julyan Rîbêra” jî weha didin zanîn ku “dije xal û polîfonî”yê cara yekemîn di konsêrvatora Kurdobayê geşe bûye di salên hezareyên zayinê de.
- Ziryab şahnaziyê bi komkirina rêpertiwarekê ve dikir ku 24 nûba saz kirin (swîta dengî û amûr)ê têde bûn. Her nûbayek pêkdihat ji parçe dengî û amûran ku bi neh livan organize bibûn, her livek rîtmeke wê ya taybet a xweser bû ku her pêçek bo yek saet bûn weku çawa di Hîndiyên kevn de hebûn.

  Ziryab zêdetirî hezar stanê dizanî ku hin ji wan li gor gotinên Elmaqarî yên Betlîmos bûne.
- Ziryab gelek ji dab û nerît(ûrf û adet)ên wê demê di nava civakê de guhertin bi taybetî di warê kinc poşîn, terza por xemlandin, çêkirina xwarin û terz û pêjînên nû, mobîlya û alavên mal û dîzayina wan, aramgirtina civakî yd..
- Guhertina berçavkên zêrî  bo berçavkên din ku ji şûş û bilûrî dihatin saz kirin.
- Îcat kirina bikaranîna paçên ser maseyê û alavên ser maseyê
- Îcat kirina poşîna kincên psî di demsala havînê de û belav kirina vê terzê. Bi temamî van îdem û demwerzên kinc poşînê îcat kirin ku bo her demekê modayekê, her weha kincên nîvê demsalê di navbera demsalan de zêde kir. Bi saya wî kincên luks ên rojhilatî li Spanyolê hat naskirin. Di bin bandora wî de şîrketeke hilbirînê ya modayê hate damezirandin ku caw û qûmaşên rengal anku rengereng û taxmen qûmaşa şûş û zelal berhem anî ku t îro jî li welatê Merakîşê tên dîtin.
- Terza nû ya xwarin pêjandinê
- Moda nû ya toryalê
- Lîstikên Çatreng(Şetrenc) û Poloyê da nasîn li Spanyolê ku wê demê çîna erstokrat û dajdaran vê lîstikê dikirin.

  *Têbînî: Lîstîka Poloyê yek ji wan lîstikan bûye ku “Selahedîn Eyûbî” jî pir jê hez kiriye.*

- Îcat kirina mobîlyayê û bi bi taybet mobîlyayên ji çermî ku bo cara yekemîn îcata wî bûn.
- Her weha Ziryab gelek îcatên moda û nûjen xiste bazarê ku bo çendîn çaxan berdewam bûn.
- Eksswarên hemam û tuwalêtê îcat kirin.
- Terza 3 jemên xwarinê di rojekê de li Spanyol û Ewropeyê.
- Geşedan bi xwarin ew ê ku Spanyolî jêre "Nekaya"yê jêre digotin ku bi awayeke çêkirî ji ava kezberî û sunbuqên şîrînkirî bi badem, fistik û şekir, mînanî "Qedayf"ê bûye.
- Ziryab şahnaziyê bi vê yekê dikir ku di çaxa wî bi xwe de keçên kole fêrî stangotinê û jenîna amûra Lût/Lotê kirin. Di nava wan de "Xezel û Nûneyde" ku bi xweşikiyên xwe nav dabûn.
- Îcat kirina "Muweşe"yê ku terza strînê ji reseniya Nûbayê giştgîr kir û ev bû sedema îcata "Muweşe"yê, anku terza stran gotinê li ser binemaya Nûbeyê.
- Terza bikaranîna rîtima Lîrîkî ligel rîtima şîîrî.
- Terza parfoman îcat kirin.
- Ziyabê Kurdî şagirtên taybet hildibijart ku her yek ji wan xwedî taybetmendiyên terz û dengên her yek cuda bûn ji yê din. Dema li cihekî bilind ji bo ders xwedinê, ferman dikir ku şagirt biçe ser wê sendela ku bi dîwarê hatiye nasîn "mîna mînberê raketiye"yê rûnê û bi dengê bilind hawar û qêrîn bike eger dengê wî bilind bû, eger bilind nebû, paçekê bi kemberê xwe bipêçe bo ku hewa teng bibe û deng baştir derkeve. Lê eger ji ber gîreka diranî nikarî baş deng veke, wî darek bi pehniya sê tiliyan dixist devê wî heta şevekê, bi vî awayî şewlîk, dev û deng baştir derdiket. Ev terz bû binehga "Opera"yê jî dûre belavê Ewropeyê bû ku bingeha wê dîsan ji îcat û hûnera Ziryabî ye.
- Gelek terz û dîzayinên estetîkê îcat kirin.

**Amra Ûd**:

Weter, jê û tela pêncemîn ji bo amûra mûzîkî ya "Ûd"ê zêdekir ku li ser şêweya gûz hîndiyê ye, her weha jêyên Ûdê ku 12 yan 14ê bûn, bûn 5 jê, di 6 yan 7 track de grop dibin, mewdaya dengê wê nêzî du oktav û nîv digire. Her ev terza nû bû ku dûre bû binegha amûra "Gîtar"ê ya ku niha di cîhanê de berbelav e, anku em dikarin bibêjin ku bingeha amûra "Gîtar"ê jî ji îcatên

Ziryabê Kurdî ye. Pêkhata amûra “Ûd”ê hevterza amûra”Lût/Lot”ê ye. Her du amûrên li Ewropeyê ji yek kokê hatine û her yek ji wan li gor dab û nerîtên civakên cuda cuda ne. Ûd û Lût-Lotê bi hêsanî tên ji hev cuda kirin bi sedemên nebûna nexşên tor û hêla mile biçûk. Ji aliyekî dî ve dibe ku Ûd û Gîtar jî çavkaniya wan yek be. Kevintirîn “Lût/Lot”a teyar li Broksela paytexta Beljîkayê di mûzexaneya amûrên mûzîkê hatibe hilgirtin. Bêguman hemû edebiyata mûzîkî ya rojhilatî jî weha derdikevin û tekez li ser curek yan çend cureke “Lût/Lot”ê dikin. Ûd weku amûreke mûzîkî ya sereke tê dîtin di mûzîka rojhilatî de. Lê vê amûrê di niha de zêdetir di nava Kurd û Ereb de tê bikaranîn û kesîn e anku lê xwedî derdikevin. Di sala 2022 de sazîn û jenîna Ûdê di lîsta nûneriya mîrasa çandî ya manewî ya mirovahiyê li Unesco’yê de di perwenda hevbeşa “Surye ta Îranê de dacî bû.

**Ziryab rola wî û nêrînên ser wî di cîhanê de**:

Îcat, afrînerî û destkeftên Ziryabê Kurdî bûne sedema ku nifş pey nifş geşetir û belavtir bibin. Li rojava(Fereng)ê zana, hûnermend, entelektuel, mûzîkjen û kesatiyên cuda cuda rêzekî mezin ji Ziryabê Kurdî digirin û ew weku bavê mûzîka Endelûsê hat binavkirin.

- Tê gotin ku Ziryab cejna Newrozê jî pîroz kiriye.
- Nimûneyek ji kesatiya “Hênrî Terase”yî ku dibêje: “Piştî hatina wî rojhilatî “Ziryab”, bayekî bi çêj û jiyaneke luks di nava Kurdobayê hilkir. Rewşeke tejî ji şîîr û xweşiyeke harîka dora Ziryabî girt. Şavane du xizmetkariyê de amade dikir ku zûrneyê dijendin. Ew behayeke bê mink da hûnera xwe. Hûnara wî mîna sihirê bû, bi taybetî ku giringiya remzên tarên Lûtê rave dikirin. Ew li ser wê yekê mukur bû çariyên yekemîn nûneratiya zerdavê(talên hêrsê), hênikahî, xwîn û mecazên reşî dikin, di demekê de a pêncemîn mîna ruhî dizanî. Her weha zanayek bû ku di warên Feleknasî û erdnîgariyê de pir mezin û zana bû û navûdengê wî mezin bû”.
- Her weha rojhilatnas li Almanyayê “Zîgrîd Hûnke” Ew di havînê 1961ê de hatibû îraqê, di pirtûka xwe û rûpela 488ê de dibêje: “Ziryab” weku “Lawê Kurd” û “Bulbulê ji Begdadê hatî”yê yek ji mezintirîn hûnermend mûzîkê ye.
- Gîtarjenê navdarê Spanyolî “Paco De Lucia” yek ji albûma xwe bi navê Ziryabê kir.
- Dîroknasê Spanyolî “Provêncsal” derbarê Ziryab weku kesekî efsaneyî û bilîmet pesn dike û bandora wî ya her salî li ser civaka Spanyolî û

damezirandina yekemîn akademiya hûnerî û mûzkî li rojavayê îslamî û nasandina mûzîka cîhanî bi rojavayê Ewropeyê weku şahnaziyeke mezin dibîne.

- Rojhilatnasê Fransî “Tomas Bowa” dibêje: Mûzîkjenê navdarê cîhanî Ziryab ku weter û jêya 5ê ji bo amûra Ûdê zêdekir di çaxa Abbasî de Kurdî bûye.
- Prof. Sîmon Gargî di pirtûka xwe ya bi navê “Mûzîka Arebî” de dibêje: Ziryab Kurd e ne ereb, ew ku professor e li zanîngeha Jênêvê Ziryab weku mûzîkjeneke nûwaze dide şan.
- Ziryab kesayetiyeke gotexweş û kelamxweş bûye, dilovan û rêzdar bûye, gelek ji etiekt û akarê hez kiriye, gel hevjîna xwe û zarokên xwe fire spend û rêzdar bûye. Zimanzan bûye di axaftinê de û edebiyata gotara wî xurt û hûnerane bûne.
- Rewşa hewayê welatan û çaxên rûbar û erdnîgarî baş analîz kiriye û çand û taybetiyên gelên derdorê jî analîz û rave kiriye.
- Di xwarinê de pirr etiket bûye, bikaranîna paçeyên ser maseyê, yek bo lêv, yek bo mil û yek bo pêş mase yd.. Ew yekem kes bû bala jinan da ser destkêş û lepikên jina ku divê cuda û bi nexş û bêhn xweş be.
- Li gor hin dîroknasan tê gotin ku bi astekê Ziryab jêhatî û esûnawî bûye di jenîna Ûdê de ku weha xeyal kiriye cin alikarê wî ne yan jî ev îlham û nîgah ji mamostayê xwe Îshaq Musilî yan bavê wî Îbrahîm Musilî yan jî apê wî Lamamyî jêre mabe.
- Jîson Wêbser di wêjarekê bi çenalê BBCê re di bernameya dîrokeke îslamî li Ewropeyê de derbarê Ziryabî dibêje: Ziryab hemû terzên poşak, kinc û xemlandinê bi xwe re anî, Begdadê wê demê Newyork û Parîsê îro bû. Ew hevîrê diranê, parfoma bedenî, terza porê kurt bi xwe re anî Kurdobayê. Ev rastiyeke ku di wê serdemê de li bajarê Kurdobayê kolan û kuçeyên wê çira têde hebûn, coyên ava pîs yên binerdî hebûn, her weha coyên ava pakij bo malan hebûn. Begdad li Îraqê niha, mezintirîn navenda hizirî û çandî bû. Ziryab ji wir hat û terza nû yên xemlandin û amadekirina maseya xwarinê û dîzayina kincên demsalî îcat kir, her weha lîstika Çetreng(Şetrenc) û Poloyê bi xwe re anî Kurdobayê. Ew nav dabû bi mêrekî selîqe xweşikî û ew berdewam bû ji baştirîn bijardeyan, nav dabû bi şîkpoşî û xemlandin û dîzayinên danisqe û nadirên bedew û harîka û xelkên Kurdobayê jî lasîn û teqlîta terzên porê wî dikirin, her weha lezet didîtin ji alavên ji çermî ku ji îcatên Ziryab bûn.

- Hezar û dused sal piştî Ziryab, dîroknasê Fransî “Hênrî Tereys” dibêje: Ziryab terzên poşak û kincên havînî û zivistanî îcat kir û bi Ewropeyê da nasîn, her weha bi hûrgûlî van rojan jî diyar kirin ku divê çi curên kinc di vê roj û demê de bêne poşîn û liberkirin. Her weha poşak û kincên werzişiyê zêde kir ku guncav bû bo demên di du demsalên cuda de. Ew bi terzên xweşik û balkêş wateyeke din da poşakê û di bin bandora wî de fabrîkayên poşak û kincan serî hilda ku kincên xet xet û reng reng û çaket ji kûtalên ron çê dikir.
- Di pirtûka 1001 îcatên kelepûrên musulmanan de dibêje:
  Eger vê care bo kirrîna moda herî dawîn û terzên sole çûye firoşgeheke şîk, giranbuha û kalîte û te xwast pantol yan kinceke havînî test bikî, ewa Ziryabî berî hezar û dused sal bîne bîra xwe, çun ku bi saya wî û îcatên wî berhemên van kincan û solan niha berdestê te ne.
- Rojhilatnasê Almanî “Chualtza” dibêje: Ziryab ciwanekî Kurd bû ku yek ji ziringtirîn fêrwazê Îshaq Musilî bû ku bi şiyanên xwe yên derhed di warê Mûzîkê de nav dabû.

**Ziryab di warê etiketê de**:

Ziryab peywest bû bi tewerên rengînîyê ve, bi selîqeya xwe yên parzûn û luksê peyv û dengî dixemilandin. Ew bandoreke mezin li ser Kurdobayê û Spanyolê bi giştî danî, xelkî bi her awayî lasîn û teqlîta wî dikirin, heta porên xwe mîna porê wî dikirin. Ziryab gastronomî bû ku gelek rêçên nadir û nûsazên nenasî da nasîn. Bêguman tek mirovek bikaribe ew qas îcar û geşe berhem bîne û hilbirîne, hêjayê lêkolîn û lêgerînên zêdetir û berfirehtir e. Cihê têramanê ye ku piranî îcat û teoriyên Ziryab hêdî hêdî ji bo welatên Frank, Fransa, Alman û bakur Îtalya yd.. hatin guhestin. Ziryab mirovê hemehûner û hemezaner bû, lew em dikarin navê wî bikin îcatkarê zanista etiket, moda, fashion, mûzîka nûjen, hûnera nûjen û tevgerên nûjen yên jiyanê ku paşî van îcat û pêşketinan belavê hemû spanyol, ewrope û cîhanê jî bûn.

Ziryab şahnaza hemû gelê Kurd û cîhanê ye jî, li gelek derên dunyayê derên fermî û taybetî hene ku bi anvê Ziryabê hatine kirin. Li welatê Marakîşê xelateke Mûzîkî heye ku navê Ziryabî hilgirtiye.

Ziryabê Kurdî efsaneyê çaxa navîn û dîroka navînê bû, îcatkarê Muşehata Endelûsê bû.

**Pêşniyaz**:

**1.**Ez pêşniyaz dikim ku dîroknas, hûnermend, modamend, bîrmend, rewşenbîran û nivîskarên Kurd, giringî zêdetir bidin jiyan û xebatên Ziryabê Kurdî û lêkolîn û lêgerînên zêdetir li ser wî bên kirin.

**2.**Çend derên rewşenbîrî, wêjeyî, hûnerî û akademî bi navê Ziryabê Kurdî bên kirin û vekirin.

**Çavkanî**:


*Çavaknî*: Plansya, G. 1928, dîroka edebiyatê, Erebî-Spanyolî, Barsîlona, rûpel 41

*Çavkanî*: Lîvî-Provênsal. Êvarîst 1950. Dîroknasê Spanyol ê musulman “Lê Kalîfat Ûmayade Dî Kurdo. Nuvêl Êdîchen. Rêv. Îslam, Parîs, Histoire du Monde de l – Agim. Jî Pî Maysonv

*Çavkanî*: Kurd kî ye. Soran Hemereş

*Çavkanî*: Rî Hans, 1999. Komedya Beşerî ya Şetrencê. Rûsêl ÎnterPrayiz. Nîvîsîna Cebrî ya Înglîzî.

*Çavkanî*: Têras, H. 1985. Îslam Dî Êspagen. Pirtûkxaneya Plon, Parîs, rûpel 52-53, une rencontre de l'Orient et de l'Occident.

*Çavkanî*: Civaka Kurdewarî di çerxên navîn de. Dr. Zirar Sedîq Tewfîq

*Çavkanî*: Çîroka ew Kurdê ku bû debistana mûzîk li Ewropeyê. Ûmêd Necim

*Çavkanî*: Rojhilatnasê Fransî “Tomas Bowa. Rûpel 12.

Çavkanî: Prof. Sîmon Gargî. Pirtûka “Mûzîka Arebî”

*Çavkanî*: Pirtûka “شمس العرب تسطع على الغرب” Dr. Zîgrîd Hunke(Dr.Sigrid Hunke)

*Çavkanî*: “زرياب منجازاته و أبرز مبتكراته الموسيقيه” M. Muheymen Îbrahîm Elcezrawî

*Çavkanî*: 1230 عاما على ولادة زرياب الموسيقي الكردي البغدادي والقرطبي. Dr. Hesîb Şehade. Zanîngeha Hêlînskî

*Çavkanî*: “زرياب الكُردى خدم الأندلس وانتشر تراپه فى أوروبا” Alî Sîrînî

*Çavkanî*: “زرياب عبقرى النغم” Fewzî Xeçer

*Çavkanî*: https://ar.wikipedia.org/wiki/%D8%B9%D9%88%D8%AF û https://ar.wikipedia.org/wiki/%D8%B2%D8%B1%D9%8A%D8%A7%D8%A8 û https://ckb.wikipedia.org/wiki/%D8%B2%DB%95%D8%B1%DB%8C%D8%A7%D8%A8

Çavkanî: pirtûka https://books.google.iq/books?id=1bzWJWiuackC&pg=PP562&lpg=PP562&dq=%D8%B2%D8%B1%DB%8C%D8%A7%D8%A8%DB%8C+%DA%A9%D9%88%D8%B1%D8%AF%DB%8C&source=bl&ots=YvF7SexVyR&sig=ACfU3U2FkrRoP0aL7_Fziy8XJn

qqJ7d3Dw&hl=ckb&sa=X&ved=2ahUKEwiH0LvR8NX8AhUFRPEDHXNtAHs4WhDoAXoECBQQAw#v=onepage&q=%D8%B2%D8%B1%DB%8C%D8%A7%D8%A8%DB%8C%20%DA%A9%D9%88%D8%B1%D8%AF%DB%8C&f=false
*Çavkanî*: pirtûka 1001 kelepûrên Îslamî.

//Vekolîn û nivîsandin: Qendîl Şeyxbizînî (Amed)

.